

Xema Giran

Enaeîte Mûrad

Zivistan sar û tar e , Narîn li ber êgir danşitî , zarok li hawîrdora wê dizîvirîn bi ken û şahî dilîstin . Narînê bi xemgînî li wan dimeyzand û temaşe dikir , hêstirên xwe bi dizî dimaland da ku zarî nizanibin ; ew digirî . Lê mixabin, girî li wê hêztir dibû, hêstirên wê balkêş û aşkere dibûn . keça mezin ya pênc salî , di cihê xwe de radiwestî bi dilşikestî berve diya xwe dihat , dipirsî û digot : Dayê ! Çima digrî ? Ez dixwezim , tu bi min re bilîzî . Keçik li ser tilyên lingan disekinî , xwe berejor hilidida û dîsan bang dikir . Dayê ! dimeyzînî , ku ez mezin bûme ? Ezê herime dibistanê , ne wilo ye ? . Narînê hêstirên germ berdidan û bi rûkî berkenî , digot : Belê keça min , ez pir şa me, ku tuyê ji pêre herî dibistanê. Keçik şadibû , diya xwe hembêz dikir û digot : Dayê , ka ji min re stiranekê bibêje ! . Narînê destê xwe di ser serê keça xwe re digerand û eniya wê ramûsa , bi dengekî nizim wê stirana şivan perwer distira " Gelî şoreşvan ! Gelî şoreşger, em ji rê dernakevinÇiqas bibîn zilim û zor ... Ew li vê çerxa Cîhanê .. Geh li jêr û geh li jor" . Keçikê çavên xwe beq dikir û li diya xwe temaşe dikir û digot : Dayê ! Ev stirana ne xweş e, çi ye ew zilm û zor ? . Divê tu yeke dî xweşiktir , ji min re bistirê . Narînê , bê ku bersiva keça xwe bide , stiraneke zarokan ji wê re distira û digot : Xewke ,xewke , xewke ...Berxa min xewke û h.w.d . Bi vê awî zaroka xwe dikire xewê . Bi ser xwe de diponijî û bi pêserojê mijûl dibû.. Ev zaroka mezin bûye , divê ji pêre biçê dibistanê . Lê zor mixabin dibistan keça min napejirîne . Gava ew rewşa kambax ,tarî û reş , li ber çavên Narînê re diçû û dihat , agir bi dilê

wê diket ,wisan jî keserên kûr dikşandin û di ber xwe de dipeyivî û digot :

Gelo ev çi jiyane ? ! Keça min ya ku peyva zilm û zorê nizane ? Ewê çawa têbigehe ku, ji ber ew keçrke Kurd e û ji kesên bênasname ye, vêca jî dibistan wê napejirîne ? . Narînê bi keserên kûr gotinên xwe berdewam dikirin û digot : Xwedê em Kurd dane lê, bêbexitiyeke dîrokî li me bûye û niha jî zarokên me , li dibistanan napejirînin. Gelo ev tonreng zor û setema bi vê hawî , li tu deveran û li serê tu kesî dî , ji bilî me Kurdan têye ajotin ?!. Narînê ev zordariya he û nasnamên me –bi zor – ji me sitandine û xak û zeviyên me jî ... piştê jî , dibêjin : Win biyanî ne ! . Bi vê awayî pir mafên me Kurdan dadiqurtîne !

Narîn hîn di wê destnavê de bû , wê pêjn û hêviyên xwe bilind dikirin û didît , ku demiqurasî li Sûriya me ya şêrîn-biha peyda bûye , wekhevî di nêv xelkê me de pêkhatî ! . Desthilatdaran biryar daye , ku kesên bê nasname nasnamên xwe werbigrin ,û weke berê ew li Sûriyê bibine hemwelatîyên rastîn . Narînê didît , ku jinên weke wê pêwîste bihevkevin , û berên xwe bidin pêşiya qonaqa serokê welêt û sipasiya wî bi vê boneyê bikin. Wê bi destê keça xwe digirt û dadikete kolanên bajarê Şamê, wê didît , ku jinên weke wê ligel zarokên xwe gelek in û hemû berê xwe dane serok û di xwepêşandaneke aştiyane de dirûşiman bi dengekî bilind dibêjin . Narînê jî , weke wan destê xwe bi hêz radikir û digot : Bijî wekhevî ! . Bimre zordarî ! . Gava wê destê xwe bi hêz radikir û dihejand ; Wa hîngê , li piyala avê dest vedipekî, av dirjî û pêre jî ew şiyar dibû , ku çi bibîne ew li rex keça xwe raketiye , peyala avê şikestî û destê wê birîn bû ye .